




# BULTENA ÇANDINIYÊ

- Li gorî Yekitiya Navenda Mêşvaniyê ya Tirkiyeyê (TAB) di sala 2021'an de 1 teneke û 26 kîlo hingiv bi buhayê bingehîn 800-850 lîre dihat firotin lê di sala 2022'yan de 300 kewar û di xebatên mêşhingiviyê de bihayê 1 teneke û 26 kîlo hingiv bi 1402 TL'an û 200 kewar bi heman fiyetê hingivîne 1860 TL'a ne.
- Li gorî daneyên Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî (FAO), Tirkiye di demsala 2021-2022'an de piştî Misir û Endonezyayê bi qasî 9 mîlyon ton genim û ceh îthalat kiriye û di cîhanê de bûye yek ji 3 welatên herî zêde ên ku hawirde dike.
- Li gorî daneyên FAO'yê li Tirkiye di salê serê her kesî 214,6 kîlogram stoqa genim a ku di cîhanê de herî zêde genim dixwe. di sala 2019'an de ev hejmar di asta 6,3 mîlyon ton de bû û tê texmînkirin ku ev mîqdar di sala 2023 de bibe 5,4 mîlyon ton û bi paş bikeve.
- Li gorî rapora FAO û Bernameya Xwarinê ya Cîhanê (WFP) ya gerdûnî û ya birçîbûnê, di sala 2021'an de ji sedî 10 nifûsa cîhanê rastî birçîbûnê hatiye.
- Hejmara kesên ku di sala dawîn de ji birçîna sedî 46 zêde bûye û gihîştîye 828 mîlyon kesan. Ji ber şewba Covid-19'ê û vir ve kesên ku birçîbûnê kêşane 150 mîlyon zêde bûye.
- Neteweyên Yekbûyî (NY) ragihand ku ji ber pandemiya Covid-19'ê guhestina avhewa û ji ber şerê domdar a li Ukraynayê, bi dehsalan têkoşîna ku li dijî birçîbûnê berdewam dike de ev rewş wekî "bervegerek bêhempa" pênase kir.
- Ji aliyê Ofîsa Genimê ya Tirkiyeyê (TMO) ji bo sala 2022'yan bihayê kirîna nîskên sor ên şêlandî serê tonê wek 14 hezar TL hat diyarkirin.
- Ofîsa Genim a Tirkiyeyê (TMO) li gor bihaya kirîna nokê şêlandî ya di sala 2022'yan de ji bo qalîteya Gîresûnê 53 TL, qalîteya Levantê 52 TL û qalîteya Sîvrî jî 51 TL hat diyarkirin. Sendîkaya Cotkaran diyar kir ku divê kîloya nokan herî kêr 85 TL'an bîn firotin.
- Midûriyeta Giştî ya Daristanan (OGM) bi hinceta "têkoşîna li ser şewata daristanan" biryara birîna hemû darên bi kûrahiya 5 metreyan li kêleka rêyên çep û rast dan. Ji ber ku li Tirkiyeyê tora rêyên daristanê 276 hezar km ye, tê plankirin ku bi milyonan dar bîn birîn.
- Di meha Gulan, Hezîran û Tîrmehê de 2022'yan de ji Çayê re sedî 43,7 sedî 2,5 û sedî 9,5 zêde bûne. Di du mehên dawî de bi giştî ji sedî 61,3 zam çêbûye.
- Hikûmeta AKP'ê bi butçeya pêvek a Hezîranê re bi giştî 376,6 mîlyar TL dahata Baca Serfikirinê ya Taybet (BBK) hedef digire. Ji baca ÖTV'ê nêzî ji 376,6 mîlyar TL'an bi 125,4 mîlyar TL'an tê plankirin ku ji titûn û alkolê were bidestxistin.
- TUÛK'ê diyar kir ku di nîsana 2022'yan de tona bihayê gubreyê 689 dolar û di meha gulanê de bûye 806 dolar. Li gor daneyên hawirdeya gubreyê ya TUÛK'ê, li Tirkiyeyê di sala 2022'yan de 193 hezar û 339 ton û di meha gulanê de jî 129 hezar û 140 ton gubre hawirde kiriye.

- Tirkîyeyê ji cihên ku li Bakurê Sûriyeyê dagir kiribû, 100 hezar dewarên biçûk da Kooperatîfên Kredîya Çandîniyê, Saziya Goşt û Şîr.
- Li Trakyayê li qadên çandîniyê yên ku salane nêzî 800 hezar ton gulberojên çêdike, ji ber êrîşa maşotan zirarek mezin çêbû.
- Li gor daneyên meha borî yên Saziya Îstatîstîkê ya Tirkîyeyê (TUİK), endeksa bihayê hilberînerê berhemên çandîniyê (Tarîm- UFE) di meha Hezîrana 2022'yan de li gor meha Kanûna Paşiyê ji sedî 0,66 kêmbûye. Sala borî li gorî navincên 12 mehan ji sedî 148,90 û li gorî navîna donzdeh mehan ji sedî 67,98 zêde bûye.
- Li gorî meha borî di berhemên çandinî nêçîr û xîzmetguzariyên pêwendîdar de ji sedî 0,91 kêmbûyîn, berhemên daristanî û xîzmetguzariyên pêwendîdar ji sedî 3,32 û di warê masî û berhemên din ên masîyan de jî ji sedî 15,48 kêmbûne.
- Bînekomen ku li gorî meha borî de kêmbûn zêde bûye de, sebze û petîx-zebeş, kok û hêk ji sedî 23,82 û fêkiyên kulîlk û fêkiyên kevirî jî ji sedî 21,74 in.
- Bi zêdekirina bihaya qutkirina serê her kîloyê 5 TL, bihaya rûn bû 98 TL û bihaya karkasa bê rûn jî bûye 100 TL.
- Piştgiriyên çandîniyê yên ku hikûmeta AKP'ê dide cotkaran, bandoreke erênî li cotkaran nake. Desteka mazotê ya ku ji cotkaran re 1 dekar genim hat dayîn 42 TL, lêçûna 1 dekar gubreyê jî bû 1200 TL.
- Li gorî rapora Midûriyeta Daristanan a Herêma Muglayê, di sala 2021'an de li Tirkîyeyê ji 118 hezar hektarî ku hatiye şewitandin 52 hezar hektar li herêma Aydın-Muglayê pêk hatiye. Hat diyarkirin ku li herêmê bi qasî 13 hezar hektar erd ji ber xetên veguhestina enerjîyê bûye ax.
- Li gundên Şamoşî û Zagor ku li herêmên Alî Bogaz û Çiyayê Mar yên navçeya Xozatê ya Dêrsimê ne û di sala 1994'an de hatibûn valakirin de ji meheke zêdetir e dar tîn birîn.
- Li Şîrnaxê darên ku bi hinceta ewlehiyê tîn birîn, her roj 600 ton ji wan wek êzing ji Sûka Keresteya ya Rihayê re tê şandin.
- Li gor daneyên Panela Dane ya Dijîtal a Federasyona Komeleyên Pîşesaziya Vexwarin û Xurekan(TGDF) hinarde di 5 mehên pêşî yên sala 2022'yan de di qadên çandinî, xurek û vexwarinê de li gor 5 mehên pêşî yên sala 2021'an ji sedî 21,1 zêdetir bûye û rêjeya hinardeyê bûye 10,1 milyar dolar. Hawirde jî ji sedî 27,8 zêdetir bûye û rêjeya hewirdê bûye 8,6 milyar dolar.
- Li gor daneyên Panela Dane ya Dijîtal a Federasyona Komeleyên Pîşesaziya Vexwarin û Xurekan di 5 mehên pêşî yên sala 2022'yan de zêdehiya bazirganiya derve li gor sala borî ji sedî 7,8 ketiye û bûye 1,42 milyar dolar. Nirxê yekîneya hinardeyê di 5 mehên pêşî yên sala 2022'yan li gor heman serdema sala borî ji sedî 6,7 zêdetir bûye û bûye 1.129 dolar/ton. Nirxê yekîneya hawirdeyê jî li gor sala borî ji sedî 11,9 zêdetir bûye û gihîştîye 673 dolar/ton.
- Li gor daneyên Panela Dane ya Dijîtal a Federasyona Komeleyên Pîşesaziya Vexwarin û Xurekan di 5 mehên pêşî yên sala 2022'yan xurekên ku di hinardeyê de derketine pêş ev in; arvan(0,54 milyar dolar), navka bindeqan( 0,41 milyar dolar) û meqerna(0,37 milyar dolar) ye. Rêjeya hemû van xurekan a di nav hinardeyê de ji sedî 13,1 e. Di 5 mehên pêşî yên sala 2022'yan de de xurekên ku herî zêde hatin hawirdekirin jî ev in; genim (1,4 milyar dolar), fasulyeyên soya (0,9 milyar dolar) û rûnê gulberojan ê xam (0,7 milyar dolar) e. Ev hersê berhem di nav tevahiya hawirdeyê de bi rêjeya ji sedî 34,8 cih digirin.

- Li gorî Panela Daneyên Dîjîtal ên Federasyona Komeleyên Pişesaziya Vexwerin û Xurekê ya Tirkiyeyê (TGDF), di 5 mehên destpêkê yê sala 2022'yan de bi 2.612 milyon dolarî hema bibêje bûye ji 3'an 1'ê yekûna derhanînê ya %30,3'an. Sektora Rûnê Nebatî di sala 2021'an de 3 milyar dolar îthalatê derbas kiriye û bûye %17,9'ê yekûna îthalatê. Di sala 2022'yan jî di 5 mehên destpêkê de bi 1.590 dolarî dîsa bûye %18,4'ê yekûna derhanînê.
- Li gorî Panela Daneyên Dîjîtal ên Federasyona Komeleyên Pişesaziya Vexwerin û Xurekê ya Tirkiyeyê (TGDF), di 5 mehên destpêkê yê sala 2022'yan de li ber heman mehên sala borî weke nirxê derhanîn herî zêde Sektora Êmê Sewalan (806 milyon dolar), Sektora Arvan (792 milyon dolar), Sektora Rûnê Nebatî (190 milyon dolar), Sektora Şekir û Tiştên ji Şekir Çêdibin (73 milyon dolar) û Sektora Qewê, Çayê, Biharta (63 milyon dolar) zêde bûye.
- Endeksa Bihayê Lêçûnên Çandiniyê (Tarım-GFE), di gulanê de mehane %5,51 zêde bûye û salane jî %123,72 bilind bûye û reqor şikandiye.
- Li gorî daneyên Borsaya Bazirganiyê ya Antalyayê, di meha tîrmehê de endeksa salane ya mîqdara firingiyê ji %16,4 zêde bûye, bihayê endeksê derketiye %243. Endeksa mîqdara zêzewat salane %28,4 zêde bûye û endeksa bihayê derketiye %169,3'yan. Endeksa mîqdarê fikî salane %28,9 zêde bûye, endeksa biha derketiye %73,2'an.
- Li gorî endeksên bihayê hilberîner û mezêxer ên meha tîrmehê yê Saziya Statîstîkê ya Tirkiyeyê (TUİK) enflasyona salane bûye %79,6; enflasyona mehane jî bûye %2,37. Li gorî daneyên TUİK'ê di meha tîrmehê de reqemên enflasyonê di nav 24 salan de derketiye asta herî bilind.
- Endeksa Bihayê Mezêxer a ENAG'ê (E-TÜFE) di meha tîrmehê de bû %5.03, salane jî bû %176.04.
- Li gorî daneyên TUİK'ê zêdebûna bihayê hin berheman salane wiha ye; kartol %274, Şekir %153, Rûn %146, Miqarne %126, Avên Fikî-Zêzewat %125, Şîr %124, Arvan %118, Rûnên Din ên Qerimî û Şilavî %99, Penir %99, Goştê Mirîşkan %98, Hêk %98, Nan %97, Rûnê Nivîşk %97, Zêzewat %97, Goştê Sor %92, Mesî %82, Birinc %78.

## Berhemên Demsalî



## Bihayên hin berheman çandiniyê û rêjeya zêdebûna wan

Berhem Kg	Bihayê Nav Erd	Bihayê Hala Mîrsinê	Bihayê Hala Stenbolê	Bihayê Mezêxer	Bihayê Meha Borî ya Mezêxer	Bihayê Sala Borî ya Mezêxer
Îsot	3-10 TL	5-15 TL	5-40 TL	10-50 TL	20-45 TL	2-7 TL
Firingî	2-6 TL	3-14 TL	5-25 TL	10-45 TL	10-30 TL	3-7 TL
Kartol	1-2 TL	3-9 TL	6-17 TL	10-32 TL	10-30 TL	2-5 TL
Pîvan Hîşk	0,25-2 TL	2-8 TL	3-10 TL	10-30 TL	8-25 TL	2-5 TL
Belican	1-4 TL	3-10 TL	7-10 TL	12-30 TL	10-25 TL	3-5 TL
Zebes	0,75-3 TL	1,50-5 TL	4-9 TL	5-12 TL	5-16 TL	1-2 TL
Mîsmîs	2-8 TL	3-8 TL	20-25 TL	25-50 TL	25-40 TL	5-12 TL
Gilyaz	3-15 TL	5-37 TL	25-60 TL	30-80 TL	20-70 TL	8-15 TL

Nîse: Bihayê berheman, li gorî maliyeta zêde û qalîteya berheman dibeke biguhere.